

## PAPER DETAILS

TITLE: Zimanê Kurdî

AUTHORS: Jaffer SHEYHOLISLAMI

PAGES: 83-106

ORIGINAL PDF URL: <https://dergipark.org.tr/tr/download/article-file/1715716>

## WERGEREK / A TRANSLATION



# Zimanê Kurdî\*

## (The Kurdish) Language

Jaffer Sheyholislami\*\*

Wergêran ji Zimanê Îngilîzî bo Kurdî: Mehmet Yonat\*\*\*

Kurd ji bo zimanê xwe di zimanê kurdî de bêjeya “Kurdî” (کوردی) bi kar dihînin. Ev beş di serî de hin agahîyen dîrokî û sosyo-çandî yên derbarê vî zimanî de dide; wekî malbata zimanî ya vî zimanî, zaravayên wî û statu û rewşa jîndariya wî. Pey van agahîyan, ji ber ku derî çarçoveya vê xebatê ye ku li ser terîfîn zimannasîye yên hemû zaravayên vî zimanî bihê sekinîn, wê tenê terîfeke zimannasîye ya Kurdîya Navendî (Soranî, ji vê şûnda KN) bihê dayîn. Li Iraqê KN xwedîyê statuyeke fermî ye û dîsa çîma ku KN ew zarava ye ku ji hêla pirê Kurdêñ Iraqê ve dihê axaftin, loma jî em ê li ser KNyê bisekinin. Hin bêje û gotinên bingehîn yên Kurdîya Navendî û Kurdîya Bakur (Kurmancî, ji vê şûnda KBK) wê bihêen dayîn û paşê wê metneke mînak ya KNyê jî li dawîyê bihê zêdekirin. Ev beş wê bi lîsteyeke pirtûk û çavakanîyên li ser zimanî bihê qedandin.

### MALBATA ZIMÊN

Kurdî aîdê şaxa rojava ya zimanêñ Îranî ye ku şaxek ji şaxêñ sereke ya malbata zimêñ ya Hînt-Ewropayê ye. Her çiqas Kurdî di bin bandora pirê zimanêñ heremê yên wekî Erebî û Tirkî de mabe jî, ew ji hêla fonolojî (sistema dengan), morfolojî (sazkirina bêjeyan) û sentaksê (rêza bêjeyan) ve cuda ye. Erebî û Tirkî di nav mal-

\* Ev gotar ji hêla Jaffer Sheyholislamî ve hatîye nivîsin û ji hêla Mehmet Yonat ve hatîye wergêrandin. Kunyeya orijinala gotarê ev e: Sheyholislami, J. (2018). (The Kurdish) Language. In Sebastian Maisel (Ed.), *The Kurds: An Encyclopedia of Life, Culture, and Society* (141-162). ABC-CLIO Greenwood. (8,000 words):

<https://www.abc-clio.com/ABC-CLIOGreenwood/product.aspx?pc=A4992C>

\* Carleton University, School of Linguistics and Language Studies, Assoc. Prof. / Zanineha Carletonê, Xendingeha Zimannasî û Xebatêñ Zimanî, Doç. Dr.

JafferSheyholislami@cunet.carleton.ca ORCID: 0000-0002-3425-5592

\* Zanineha Mêrdîn Artukluyê, Fakulteya Edebîyatê, Beşâ Ziman û Edebîyata Kurdî, Dr. Mardin Artuklu University, The Faculty of Literature, The Department of Kurdish Language and Literature. mehmetyonat@gmail.com ORCID: 0000-0001-8576-7486

bata zimanî ya Hînt-Ewropayê de nînin. Ji hêla zimannasîyê ve, Kurdî nêzîkî Farisî, Belûçî û Peştûyî ye. Ew xwedîyê hin bêjeyên bingehîn yên kevnare ye ku bi zimanên Ewrupî re hevpar in: wekî “du” ku di Îngilizî de “two” û di Firensî de “duex” (“x”a dawî nayê xwendin) e; “no”(Kurmancî “Neh”)<sup>1</sup> ku di Îngilizî de “nine” û di Fransî de “neuf” e, “pênc” ku di Yûnanî de “Pente” e; “pê” ku di Fransî de “pied” (“d”ya dawî nayê xwendin) e; “bira” ku di Îngilizî de “brother” e; “dan” ku di Fransî de “dent” (“t”ya dawî nayê xwendin û “e” wekî “a” dihê xwendin) e.

## ZARAVAYÊN KURDÎ

Wekî piranîya zimanan Kurdî jî xwedîyê hin zarava û devokan e. Bêyî ku di navbera axêverên hin ji van zaravayan têkilîyeke zimanî ya mezin tunebe, dibe ku axêverên van zaravayan hevdu fêm nekin. Yanê, dibe ku axêverê zaravayekê ji hêla axêverê zaravayê dinê ve neyê fêmkirin. Hin caran cudahîyên zimannasîyê yên di navbera zaravayan de ew qas pir in ku ew zarava ji hêla hin zanyaran ve wekî zimanên cuda hatine hesibandin. Lêbelê, piranîya Kurdan zaravayên xwe wekî Kurdî terîf dikan. Ji vê nêrînê ya guncaw ew e ku Kurdî wekî zimanekî makro bihê hesibandin.

Li gor krîtera fêmkirina hevdu (mutual intelligibility) û îsbatên zimannasîyê, zaravayên Kurdî dikarin di bin pênc gruban de bêن dabeşkirin: Bakur (Kurmancî), Navend (Soranî), Başûr (Kirmanşanî), Zazakî û Goranî/Hewramî. Gelek zimannasên zimannasîya teorîk di wê bawerîyê de ne ku her du grubêن dawî ne Kurdî ne, lewra ew ji hêla zimannasîyê ve gelek ji Kurdîya rast (her sê grûbêن din) dûr in. Lê piranî axêverên Zazakî û Goranî/Hewramî ji xwe re dibêjin Kurd. Ew her du grub xwedîyê gelek bêje û hin taybetîyên rêzimanî ne ku bi grubêن din yên Kurdî re hevpar in.

Piranîya Kurdan, Kurmancî wekî zimanê xwe yê zikmakî û yê mîrate (heritage language) qebûl dikan. Ev Kurd li Turkiyê (teqrîben 10 heta 15 milyon), li Sûriyê (teqrîben 2 milyon), li Iraqê (1 hata 1.5 milyon) û li Iranê (teqrîben milyonek) û li Ermenîstan û welatên derûdora wê (teqrîben 500,000 heta 1 milyon) dijîn. Hin bajarên mezin yên ku li wan Kurmancî dihê axaftin ev in: Dîyarbekir (Amed bi Kurdî) li Tirkîyeyê, Duhok li Iraqê, Qamişlo li Surîyê û Urmîye (Wirmê) li Iranê. 500,000 axêverên vî zaravayî li Emerîkaya Başur û Ewrupayê, bi taybetî jî Almanyayê dijîn.

Di dawîya sedsala 16an de Kurmancî zaravayê nivîskî yê vî zimanî bûye. Lê ji ber wê sedema bingehîn ku Kurd xwedîyê dewleta xwe nebûne, ev zarava heta nîveka sedsala 20an ji zimanekî nivîskî û standard zêdetir wekî zimanê axaftinê maye. Di piranîya sedsala 20an de Kurmancî hem li Tirkîyeyê hem jî li Surîyê

---

1 Nota Wergêrî

hatîye qedexekirin. Li Îran û Iraqê, ev zarava ji dibistan û sazîyên hukumatê zêdetir di qadêñ taybet û şexsî de hatîye bikaranîn. Bi xêra hin rewşenbîrên li surgûnê, wek mînak Celadet Elî Bedirxan, ev zaravayê Kurdî bi awayekî cîddî di salêñ 1949an de standardîze bûye.

Di sala 1992yan de Turkiye qedexeya li se Kurdî rakirîye û li vê dewletê, em şahidê pêşdeçûyînan bûne. Hin ji van pêşdeçûyînan ev in: Bilindbûneke bêemsal ya di çapemenîyê de, kursêñ hînbûn û hînkirina kurdî, hem di qada taybet hem jî di qada fermî de vekirina qanaleke televîzyonê (TRT Kurdî) ya 7/24 ya ku ji hêla devletê ve dihê sponsorkirin.<sup>2</sup> Lê Kurdî hêj jî xwedîyê statuyeke fermî nîne li Turkîyê û li Turkîyê, herema Kurdan di nav de, Kurdî hêj ne zimanê dibistanan e. Li Îranê jî rewş wekî vê ye. Lê li Iraqê, ji sala 1992yan vir ve, wexta ku Kurdêñ Iraqê bûn xwedîyê otonomîya politîk, Badînî ku devokeke Kurmancî ye, bû zimanê fermî yê defakto yê bajarê Dihoka Iraqê. Çawa ku Kurdî bû zimanê hukumeta heremî û gelek rojname, qanalên TV û radyoyan hatin weşandin, bi heman rengî Kurdî zimanê sîstema perwerdehîyê ya bajarêñ wê heremê ye jî. Kurmancî ji 2014an vir ve bûye zimanê fermî yê Kurdistanâ Surîyê. Lê ev ziman xwedîyê tu statuyeke pozîtîf nîne li Îran û Turkîyê. Di her du dewletan de ev zarava dihê tolerekirin (yanê, qedexe nîne), lê ew xwedîyê tu piştgirîya dewletê nîne. Her çiqas di vî zaravayî de çapemenî mumkun be jî û medyaya dewletê wê ji bo weşana TVyê bi kar bîne jî, ew zimanê sîstema dibistanan, zimanê hukumatê an jî yê însîtuyên taybet nîne.

Kurdîya Navendî (Soranî) gruba duyemîn ya mezin ya zaravayên Kurdî ye ku ev ji gumanê re vekirîye. Tenê li Îran (teqrîben 3.5 mîlyon) û Iraqê (teqrîben 4 mîlyon) dihê axaftin. Her çiqas kevneşopa nivîskî ya vî zaravayî du sedsal pey Kurmancî dest pê kiribe jî, vî zaravayî serdestîya xwe di destpêka 1800an de bi dest xist. Ji 1930an vir ve li Iraqê, KN bûye yek ji zimanê fermî yê medya, dibistan û yê hukumetên heremî li Suleymanîye, Hewlêr û Kerkukê ku piranîya Kurdêñ Iraqê lê dijîn. Di sala 1945an de wexta Kurdêñ Îranê li Mehabadê komareke temenkin ava kirin, Kurdî bû zimanê fermî yê dewletê. Lê ji wê wextê vir ve, ev ziman û zimanê wekî wê yên kêmaran hatin marjînalizekirin; ev ziman, ne bû zimanê ensîtuyên taybet û yên rêveberîyê û ne jî bû zimanê dibistanan. Di îlona 2015an de Zanineha Kurdistanê (Senendec, Îran) bernameya lîsansê ya ziman û edebîyata Kurdî vekir. Yek ji armancêñ bernameyê gihadina mamosteyên Kurdî bû da ku wexta hukumetê heqêñ zimanî qebûl kirin ev mamoste bikaribin di dibistanan de vî zimanî fêr bikin. Li Iraqê rewş bi temamî cuda ye. KN zimanê fermî û yê herî berbelav yê ragihandin, dibistanan û nivîsên fermî yên Hukumeta Heremî ya Kurdistanê ye. Bikaranîna Erebî bi mizgeft û hin sektorêñ qanûnî û tenduristîyê

2 Ji bili van pêşdaçûyînan di hin Zanineha Turkiyeyê de beşen ziman û edebîyata Kurdî hatine vekirin. (Nota Wergêr)

ve sînordar e ku di van sektoran de Kurdî hêj xwedîyê termînolojîyeke têr nîne ji bo kar bi awayeke baş bimeşin. Ne wekî 30 sal ewil, iro gelek zarokên Kurdistana Iraqê bêyî ku Erebî baş hîn bibin, mezin dibin û dibistana xwe diqedînin. Di şûna Erebî de Îngilizî li heremê zêdetir populer e. Sih sal ewil, xwendekaran, di sinifa şesan de tenê bi du saetan dest bi dersên Îngilîzî dikirin. Lê iro, Îngilizî ji sinifa yekem dest pê dike. Heta li hin cihan ji pêşdibistanê dest pê dike.

Wekî KNyê, Kurdîya Başûr wekî Kirmanşanî dihê zanîn, li Îran û Iraqê dihê axaftin. Bajarêن mezin yên wekî Kirmanşaha Îranê û Xaneqîn û Bexdaya? Iraqê xelk bi vî zaravayî diaxivin. Li Îranê, piranî axêverên vî zaravayî li cihêن gundewarî dijîn, lê gelek merkezêن bajaran wekî Kirmanşahê, asîmîle bûne û zimanê wan bûye Farisî. Ji bo wexteke gelek dirêj, bikaranîna vî zaravayî kêm bûye û di malan de û di nav cihêن nefermî û biçûk de maye. Lê di salêن dawîn de xelk bi weşana pirtûkan, weşanêن demî û rûpelên webê ve zêdetir bala xwe dane li ser vî zaravayî.

Zazakî an ji Dimilî ji hêla nêzîkê 2 mîlyon axêver ve li Turkiyê dihê axaftin. Ji bilî grubeke edebî, piranî Zaza xwe ji hêla etnîkî ve Kurd dihesibînin. Piranî zimannas û filolog, piranîya wan Ewrupî ne, di wê fikrê de ne ku Zazakî ne zaravayeke Kurdî ye lê zimanekî cuda ye. Dîyarbekir ji bilî axêverên Kurmancî merkezek ji merkezêن mezin ya axêverên Zazakî ye. Ji salêن 1980yan vir ve, aktîvîst û şexsîyetêن edebî yên Zazakî ji bo standardkirina vê devokê gelek ked dane û ev devok di qada medyayê de bi kar anîne û heta derecyekekî kursêن ziman vekirine.

Wekî Zazakî Goranî/Hewramî ji ji alîyê gelek zimannasên Ewrupî ve wekî zaravayeke Kurdî nayê hesibandin. Esas, ev zimannas di wê bawerîyê de ne ku Zazakî û Goranî naşîbin zaravayê din (Zaravayê Bakur, Navend û Başûr) lê dişîbin hevdu. Goranî ne wekî Zazakî li dewletekê (Turkiyeyê) li du dewletan (Îran û Iraq) dihê axaftin. Hejmara axêferên vî zaravayî teqrîben 100.000 e ku li gor zaravayê din axêverên wê gelek kêm in. Dîsa kêm zêde ev zarava hatîye standardkirin û ji bilî hebûneke kêm ya di medyayê de bikaranîna vî zaravayî bi cihêن nefermî ve sînordar e. Wexta zarok diçin dibistanê li Kurdistana Iraqê KNyê û li Îranê ji Farisî hîn dibin, divê em Goranî/Hewramî wekî zimanekî di bin xetereyê de bibînin (Ji bo agahiyêن zêdetir binêre Sheyholislami, 2015). Şopînerên Kaka'î û Ehlî Heq devokeke Goranî/Hewramî diaxivin (Sheyholislami, 2015).

## TERÎFA ZIMANNASÎYÊ

### Zaravayê Standard

Terîfeke zimannasîyê ya hemû zaravayê Kurdî derveyî çarçoveya vê xebatê ye. Loma ji vê şûnda em ê li ser terîfên bingehîn yên Kurdistana Navendî (KN) bisekin. Her wekî li jorê ji hate gotin, sebeba vê tercîhê ew e ku KN ne tenê zimanekî ji zimanê fermî yê Iraqê ye lê di heman demê de ew, zimanê xebatê yê berbelav û

fermî yê Hukumeta Heremî ya Kurdistanê (HHK) ye. Dîsa bêguman ew zaravayê herî standardbûyî ye. Lê berîya terîfeke zimannasîyê ya KNyê bihê dayîn, wê li ser cudahîyên bingehîn yên her du zaravayên mezin yên Kurdî bihê sekinîn (Binêre Tabloya 1.).

**Tabloya 1.: Cudahîyên Morfosentaksî yên Soranî û Kurmancî**  
**(Haig û Öpengin, 2015: 5-6).**

Soranî	Kurmancî
1. Hebûna paşgira nasyarîyê	Tunebûna paşgira nasyarîyê
2. Paşgira pirjimarîyê ya gelempirbûyî	Paşgira pirjimarîyê tenê di rewşa tewandî de
3. Hebûna cînavkên klîtîk	Tunebûna cînavkên klîtîk
4. Wundabûna forma dîrek ya <i>eza</i> cînavka şexsê yekem yê yekjimar (di hemû devokan de); nebûna formên rewşan yên hemû cînavkên şexsî yên serbixwe (Lê di hin devokan de wekî Mukrî, şexsê sêyem yê yekjimar ji hêv cuda ne. (binêre Öpengin)	Berdewamîya cudahîya <i>ez/min</i> di şexsê yekem de, berdewamîya rewşa tewandî û rafteraşt di hemû cînavkên şexsî de (di hin devokan de şexsê duyem yê yekjimar kelijîne)
5. Di gelek mintiqeyan de wundabûna cudahîya zayendê (di hin devokan de berdewam e, wekî Mukrî)	Berdewamîya zayendê
6. Hebûna avanîya tebatî ya morfoljîk	Tunebûna avanîya tebatî ya morfolojîk, tebatîya analîtîk ya bi lêkera alîkar “hatin”ê ve.
7. Nebûna forma serbixwe û forma nîşander yên ïzafeyê	Forma serbixwe û forma nîşander yên ïzafeyê
8. Tîpa hevedudanî ya vekirî ya ïzafeyê	Tunebûna tîpa hevedudanî ya vekirî ya ïzafeyê (Lê di hin devokên nêzîkê Soranî de bikaranîneke sînordar heye, wekî Şemzînan)
9. Wundabûna nîşankerên rewşê li ser navdêran û li ser hemû cînavkên şexsî (Lê di hin devokan de bi awayeke marjînal heye, wekî Mukrî)	Nîşankerên rewşan li ser hemû navdêr û cînavkan heye (Di hin devokan de li ser navdêren nêr yên yekjimar wunda bûye)

Cudahîyên ku di Tabloya 1ê de hatine dayîn dikare kaffî bihê ji bo ku hin zimannas bigihêjin wê encamê ku ev her du zarava bi qasî Almanî û Îngilizî ji hev cuda ne û lewra ji ne wekî zaravayên zimanekî lê wekî du zimanên cuda bênen hesibandin (Ji bo nirxandineke tam ya gengeşîya berdest ya li ser ziman û zaravayan, bi taybetî di çarçoveya Kurdî de binêrin Haig û Öpengin, 2014).

Li vir, ez ê li ser maddeyeke tabloya 1î kûr bibim: maddeya 5an, zayenda rêzimanî. Bereksê KNyê, hemû navdêrên KBKyê xwedîyê zayenda rêzimanî ne; ew navdêr yan nêr in yan jî mê ne. Ev dikare wekî aliyê herî zehmet yê KBKyê bihê nixandin ji bo hînbûna wê ji hêla kesên vî zaravayî wekî zimanê duyem hîn dibin ku di nav wan de axêverên KNyê jî hene. Lewra zayenda rêzimanî yê navdêran piranî caran bi zagonan nayê zanîn. "Pirtûk" mê ye; û dibe "pirtûka min"; lê çima "hesp" nêr e ew dibe "hespê min". Di KNyê de avanîya xwedîfîyê ji bo her duyan jî wekhev e; "pertûkî min, hespî min" (Di vê derê de îya li dawîya navdêran hatîye zêdekîrin îzafe ye ku em ê dûre li ser bisekinin) (ji bo agahîyên zêdetir, binêre Haig û Öpentin: 2015).

## FONOLOJÎ

### Dengdêr

Dengdêrên KN û KBKyê ji heşt dengan pêk dihêن: pênc heb dengdêrên dirêj (a, i, e, o, u) û sê heb dengdêrên kin (æ, ɔ, ı). Di tabloya 2yan de dengdêrên Kurdî li gor AFNê (Alfabeya Fonetik ya Navneteweyî) hatine dayîn. Ev heşt dengdêr di KN û KBKyê de hevpar in. Lê li hin cihan, sîstema dengdêran dibe ku sabît nebe. Wek mînak, fonemên e û oyê dibe ku bi halêن xwe yên dirêj yên i: û uyê ve di nav guherînê de bin. Mesela, bêjeya "sor"ê dibe ku di hin hereman wekî /sur/ û hin cihan jî wekî /sor/ (di KBKyê de jî) bihê gotin. Dîsa bêjeya "anîn"ê dibe ku li hin hereman wekî /benæ/ û hin cihan jî wekî /bi:næ/ bihê gotin. Di KNa standard te ev her du bêje wekî /sur/ û /benæ/ dihêne qebûlkirin.

### Bêdeng

Di Kurdîya Navendî de 27 bêdeng hene (binêre Tabloya 3.). Her çiqas piranî van bêdengan xwedîyê çavkanîyeke Hînt-Ewrupî bin jî, hin ji wan ji Erebî têne: wekî bêdengên q, ȝ û fiyên navên Erebî yên Qadir, Abdullah û Hamîd. Ji bilî du bêdengan, bêdengên Kurdî û yên Îngilizî kêm zêde wekî hev in. Ya ewil, denga ewil ya bêjeyen Îngilizî yên "that" û "think" in ku di Kurdî de tunene. Ya duyem, bêdenga yyê ye ku di bêjeya Fransî ya "dorier" de heye û bêdenga xyê ye ku di Almanî de di bêjeya "loch" de heye. Ev her du bêdeng di Îngilizî de tunene lê di Kurdî de hene.

### Tabloya 2.: Dengdêrên Kurdî yên di Kurdîya Navendî û ya Bakur de Hevpar

	Pêş	Navend	Paş
Girtî	i:	ı	u, ɔ
Nîvgirtî	æ, e		o
Vekirî	a		

### Tabloya 3.: Bêdengên Kurdiya Navendî

	Dulêvi (biblabial)	Lêvdidanî (Labiodental)	Didanî (Dental) / Alveolar	Kampiduyî (Palatoalveolar) /Palatal	Paştkamî (Velar)	Zimanokî (Uvular)	Pharyngeal	Gewriyî (Glottal)
Stops û affricates	p, b		t, d	č j	k g	q		?
Xişok (fricative)		f, v	s, z	ʃ ž	x y		ħ f	h
Difnî (Nasal)	m		n					
Approximants	w				y			
Tepok (flap), lerzok (trill)			r, r					
rexkî (laterals)			l		ł			

Her çiqas sîstema dengdêran ya her du zaravayên mezin wekî hev bin jî, hin cudahîyên berçav di sîstema bêdengan ya her du zaravayan de hene. Bêdenga *vyê* di zaravayê KBKyê de ji KNyê zêdetir e. Di heman demê de bêdenga *wyê* di KNyê de zêdetir e. Di gelek leksîkonan de *wya* KNyê, di KBKyê de dibe *v*: *aw* (KN) *av* (KBK), *pêlaw* (KN) *pêlav* (KBK), *lêw* (KN) *lêv* (KBK), *şew* (KN) *şev* (KBK). Di KNyê de dengên alveolar ya tepok (flap) /r/ û ya lerzok (trill) /r/ ne tenê du deng in lê du fonem in jî; di asta fonemîk de ew cuda ne; wekî *ker* /kær/ û *keř* /kær/. Ew rewş di her du rexkîyan (lateral) de jî heye; rexkîya /l/ û ya /h/yê. Ev her du dengên nêzîkî hevdu di gelek zimanan de hene, lê KBK û Îngilizî jî di nav de ev her du deng di asta fonemîk de nayêن nîşandan. Yanê, di Îngilizî de hun dixwazin bi /l/ya sivik bêjin /blæk/ an jî bi /h/ya hişk bêjin /blæk/ wateya “black” (reş) naguhere. Lê di KNyê de ev her du deng wateyê diguherînin. *kel* (gir) ji *kełê* (bûfalo) cuda ye, dîsa *gul* (gul) ji *gulê* (Nexweşê cuzzamê) cuda ye.

### Alfabé

Kurdî bi alfabeyêن cuda ve hatine nivîsîn. Lê îro, piranî bi du forman ve dihê nivîsîn. Yek li ser alfabeya Erebî û Farişî hatîye avakirin û li Îran û Iraqê dihê bikaranîn. Li vir, em ê ji bo vê bêjin Kurdo-Erebîk. Alfabeya din wekî alfabeya Kurdo-Latînî dihê navkirin û bi piranî ji hêla Kurdêñ Ermenîstanê, ku li wê derê berê alfabeya Krîlî dihat bikaranîn, Kurdêñ Turkiyê û Sûrîyê ve dihê bikaranîn (Tabloya 4an û mînakêñ di dawî de binêre). Her wekî dihê texmînkirin, alfabeya Kurdo-Latînî dişibe alfabeya Tirkî. Tişa balkêş ew e ku Kurdêñ Sûrîyê bi heman alfabeyê ve dînîvîsin ku ev alfabe bi temamî ji alfabeya zimanê Erebî cudatir e ku li Sûrîyê domînat e.

### Alfabeyên Kurdi

Zimanê Kurdî ji alfabeyeke hevpar û formeke standart mehrûm e. Du zaravayên standart hene: Kurmancî û Soranî. Soranî hem li Îranê û hem jî li Iraqê bi hin

cudahiyê ortografiyê ve bi alfabe Farisî-Erebî ve dihê nivîsîn. Her çiqas di nivîsa Erebî û Farisî de alfabe fonemîk bi piranî tenê bêdengan nîşan bide jî, di nivîsa Kurdî de alfabeke modîfiyekirî dengdêran jî nîşan dide. Kurmancîya standart li Iran, Iraq û Sûrîyê bi alfabe Farisî-Erebî ve û li Turkîyê, Ermenîstanê û Sûrîyê jî bi alfabe Kurdî-Latînî ve dihê nivîsînê. Kurd xwedîyê gelek alfabe û şiklên nivîsan in, lewra ew li welatêna cuda bi alfabe û şiklên nivîsîn cuda ve dihê nivîsîn.

Di tabloya 4an de fonemên Kurdî bi AFN (Alfabeya Fonetîk ya Navneteweyî), Kurdo-Latînî û Kurdo-Erebîk ve hatine nîşandan. Li ber wan mînakêne Kurdî û Îngilizî hatine dayîn da ku her dengekî nîşan bide. Divê ev bihê gotin, dengdêra kin /i/ tenê di alfabe Kurdo-Latînî de heye, wekî *min*, lê di alfabe Kurdo-Erebîk de tune, wekî من (m+n). Ji aliyê din ve, stopa gewrîyî (?) ku berîya dengdêren serê bêjeyê dihê, di alfabe Kurdo-Latînî de tune ye. Yanê, bêjeya *erê* di alfabe Kurdî-Latînî de wiha dihê nivîsîn "erê" lê di alfabe Kurdo-Erebîk de bi vî awayî dihê nivîsîn: ئەرە (ئ+e+r+ê). Dîsa her çiqas axêverên KBKyê dengen y û ئ yê bi kar bînin jî, ew di alfabe standart ya Kurdî-Latînî de tunene. Muhetemelen ev ji ber bandora sîstema nivîsê ya Turkî ye. Du deng û tîpêni di alfabe Kurdî-Latînî de tunene ev in: lerzoka alveolar /r/ û velara rexkî ///. (ji bo mînakâna Tabloya 4an binêre).

**Tabloya 4.: Alfabeyên Kurdî (HE: Hînt-Ewrupayî; KBK: Kurdiya Bakur)**

AFN	Kurdo-Latînî	Kurdo-Erebî	Dengê nêzik di Îngilizî de	Mînakêne yên bêjeyêne Kurdî
?	*	؟	Dengê di navberan dengdêren uh-oh de	azad نازد
a	a	ا	but, cut	ba, ب
b	b	ب	brother	bira, بر
j	c	ج	jam	ciwan جوان
č	ç	چ	church	çem, چم
d	d	د	dad	dû, دو
æ	e	ە\ە	had	de, دە
e	ê	ئ	bed	sê سى
f	f	ف	father	fîr فېر
g	g	گ	garden	ga گا
ý	x	خ	r ya Dorier (Fransî)	bax باخ
h	h	ھ - ھى	honey	heval ھەۋال
h	h	ح	Muhammed	Muhammed مۇھەممەد
ؤ	‘	ع	Ali (Ne HE ye)	Elî علەي
i:	î	ى	seed	sî سى
ı	i	-	sit, bit	min من

k	k	ك	cake	kek كياك
l	l	ل	label	lale لاله
ł	ł	ڦ	label	bał بال
m	m	م	mother	min من
n	n	ن	no	na نا
o	o	و	door	bo بو
p	p	پ	pet	pare پاره
q	q	ق	Quran (Ne HE ye)	Qur'an قورئان
r	r	ر	red	rê برى
r	ř	ڙ	r ya xişok	keř كير
s	s	س	simple	serma سرمما
ʃ	ʂ	ش	shed	šeř شەر
ʒ	j	ڇ	pleasure	jîyan زيان
t	t	ت	telephone	telefon تەلەفۇن
u	u	و	put	Kurdî كوردى
u	û	وو	boot	dûr كورور
v	v	ف	vowel	govar گۈفار
w	w	و	wind	wane وانه
x	x	خ	loch	xak خاك
y	y	ى ، بىيى	yellow	yek يېك
z	z	ز	zebra	zengin زەنگىن
ž	j	ڏ	pleasure	jin ڏن

## Morfolojî

Di KNyê de navdêr di sê halan de ne: Rasterast, nedîyar û dîyar. Di halê rasterast de navdêr ti patîkel (wekî a, an, the yên Ingilizî) an jî gire nastînin. Ev aspekta genrik û forma leksîki ya navdêrê ye (wekî hengwîn şîrîn e). Halê nedîyar wekî "a" û "an" a Ingîlîzî bi paşgira êkê ve dihê dîyarkirin û eger navdêr bi dengderekê biqedede ev dibe *yek*: kuřek, kiçek, mamostayek. Halê dîyar ji bo navdêrên bi *e* û *a* yê ve diqedîn paşgira *ke* û *ji* bo hemû navdêrên din paşgira *ekeyê* disfînin: piyaweke, kureke, derwazeke (pire), çiyake, Hewlêriyeke, rîyeke, dîyeke (gund), şûyeke (mêr).

Navdêr bi paşgira *anê* ve dibin pirjimar. Navdêrên bi bêdengan ve diqedin *an* û yên dengdêran ve diqedin *jî* bi *yanê* ve dibin pirjimar. Ji bo navdêr hem bibe dîyar hem *jî* bibe pirjimar, li gor tîpa dawî ya navdêrê paşgirên *ekan* û *yekan* li navdêrê zêde dibe. Wekî mindal > mindalan, dê (gund) > dîyan, mindaleke > mindalekan, dîyeke (gund) > dîyekan.

## Cînavkêن Şexsî

Wekî di Tabloya 5an de hatîye nîşandan şeş cînavkên şexsî hene.

Wek mînak, *min mamoslam, to qutabî(t), ême Kurdîn, êwe Amrîkîn.*

### Tabloya 5.: Cînavkên Şexsî

Cînavkên Şexsî	
Yekjimar	Pirjimar
min	ême
to	êwe
ew	ewân

### Tabloya 6.: Cînavkên Xwedîtîyê

Yekjimar	Pirjimar
-im	-man
-it	-tan
-i/y	-yan

Xwedîtî bi paşgiran ve dihêne çêkirin ku li navdêran zêde dixin. Wexta di rewşa rasterast de li navdêran dihêne zêdekîrin dengen di tabloya 6an de derdixin.

Mesela, *kitêbim, kitêbî, kitêbman, kitêbtan, kitêbyan.* Ev paşgir di heman demê de dikarin di halê nedîyar de ji li navdêran bêñ zêdekîrin. Wek mînak, *kitêb+êk+im* (kitêbeke min) (halê nedîyar) û *kitêb+eke+m* (kitêba min) (halê dîyar).

### Nîşander

Nîşanderên Kurdî ev in: *eme* (ev, vî, vê), *ew* (ew, wî, wê), *emane* (ev, van), *ewane* (ew, wan). Wek mînak, *eme kitêb e* (Ev kitêbek e), *ewe baş e* (Ew baş e). Wexta nîşander wekî rengdêrên nîşanê dihêne bikaranîn û navdêrê modîfiye dikin, dîsa ev nîşander dihêne bikaranîn. Navdêr di navbera her du perçeyêvan nîşanderan de dihê bikaranîn: *em piyawe* (ev mîrik, vî mîrikî), *ew jine* (ew jînik, wê jînikê). Dîsa di vê avanîyê de paşgira pirjimarîyê ji nîşander radibe û li navdêran zêde dibe: *emane hatin* (Ev hatin) lê *em kesane hatin* (Ev kes hatin).

### Avanîya Îzafeyê di Rewşa Xwedîtî û Centîfê de

Îzafe “of” a îngîlîzî ye. Di Kurdî de dengdêra “î” her du aliyêvanîya cenetîfê girê dide, wek mînak, *utombêlî min, utombêlî to.* Lî wexta navdêr bi dengdêra *ayê* diqedede, dengdêra i /iya îzafeyê dibe yî; wek mînak, *şorebî-yî tenya* (dara bîyê ya tenê). Wexta navdêr bi dengdêrên din ve diqedin îzafe dibe y; wekî *mamostay min, dêy êwe* (gundê we), *beşey ême* (cilêñ me), *mûy to*.

## Rengdêr

Avanîya herî berbelav ya ravekên rengdêrî ev e: navdêr+î (îzafe) + rengdêr. Wek mînak, *kiçêkî wirya* (keçeke jîr), *filmêkî xoş* (filmeke xweş). Her çiqas pêkan be lê ne berbelav be jî rîza vê avanîyê dibe ku berevajî be: rengdêr+e+navdêr wekî *şorejin* (jinkok). Wexta ev avanî hate bikaranîn navdêr hevedudanî dihê nivîsîn: *şengebêrî* (bêrîvana rindik) yan jî *kerepîyaw* (mêrikê ker).

Payeya rengdêran bi zêdekirina paşgiran li rengdêran ve dihê çekirin: *tir* ji bo payeya berawirdkirinê (comparatives) (wekî “er” û “more” a Îngilizî) û *tirîn* jî ji bo payebalayê (superlatives) (wekî “-st” û the most” a Îngilizî) dihê bikaranîn: *xêratir* (leztir), *xêratirîn* (leztirîn), *cuwantir*, *cuwantirîn*.

Hoker bi piranî tenê di formekê de ne û nakevine formên din. Lê piranîya wan bi zêdebûna paşgira *ane* an jî bi pêşgira *beyê* li bêjeyê ve çê dibin: *zîrekane*, *sałane*, *be xêrayî* (bi lezî).

## Daçek

Di kurdî de pêşdaçek, paşdaçek û bazinedaçek hene. Pêşdaçekên pir dihêne bikaranîn *le*, *wek*, *le ser*, *pêş*, *paş* in. Gelek pêşdaçek ji bo wate bisfînin, pêdivîya wan bi paşdaçekan hene. Wek mînak, *le Kurdistan* dihê wateya (li Kurdistanê), lê *le Kurdistan ewe* dihê wateya (Ji Kurdistanê). Mînakeke din bi vî awayî ye, *le ew kate da* (di wê demê de), lê *le ew kat ewe* (ji wê demê). Bazinedaçek ew daçek in ku li her du alîyê yekîtîya bêjeyî dihêne bikaranîn. Di Îngilizî de zêde berbelav nînin, lê di Kurdî de gelek berbelav in. Jêbirîna aliyeke bazinedaçekê dibe ku meneyê bi awayekî berbiçav jî holê raneke. Mesela meneya van her du frazan hema bêje wekî hev e: *le ew kate da* (di wê demê de) û *ew kat* (wê demê). Lê dibe ku rakirina daçkekê wateyê bi awayeke cîddî biguherîne: wekî *ew kat ewe* (ji wê demê vir ve) jî *ew kat* (wê demê) cudatir e û *kat ewe* tu wateyeke xwe tune.

## Jimarêñ Resen

Ev gelek nêzikê jimarêñ Farisî ne. Wexta bi alfabeşa Kurdo-Latînî dihên nivîsîn, ku bi piranî bi Kuramancî dihên nivîsîn, wekî Îngilizî ye. Lê wexta bi alfabeşa Kurdo-Erebî dihên nivîsîn, jimar wekî di tabloya 7an de dihên nivîsîn.

Jimar berîya wan navdêran dihên nivîsîn ku wext û jimaran nîşan didin: *dû roj*, *sê sał*, *no mang*, *yek saat*, *de car*.

Jimarêñ jî jimarêñ resen dihêne çekirin ku ev jimarêñ resen wexta bi bêdengerekê biqede paşgira *-amê* û wexta bi dengderekê diqede jî paşgira *hemê* distîne ku di tabloya 8an de hatine nîşandan. Rojêñ hefteyê bi vî awayî ne: *Şemme*, *Yekşemme*, *Düşemme*, *Sêşemme*, *Çarşemme*, *Pêncşemme*, *Heynî/Cum'e*.

Demsal ev in: *behar*, *hawîn*, *payîz*, *zistan*. Meh ev in; *xakelêwe* (Navbera 21ê adarê û 20ê nîsanê), *gulan* (Navbera 21 nîsanê û 20ê gulanê), *cozerdan* (Navbera 21ê gulanê û 20ê hezîranê), *pêşper*, *gelauêj*, *xwermanan*, *řezber*, *xezewer*, *sermawez*, *berfanbar*, *rêbendar*, *řeşeme*.

**Tabloya 7.: Jimarêñ Resen**

Îngilizî	Kurdî	کوردى	کوردى
0	sifir	سەفر	٠
1	yek	پەمەك	١
2	dû	دوو	٢
3	sê	سەن	٣
4	çar	چار	٤
5	pênc	پىنچ	٥
6	şes	شەش	٦
7	fiewit	ھەوت	٧
8	heşt	ھەشت	٨
9	no	نۆ	٩
10	de(h)	دە	١٠
11	yazde	پازدە	١١
12	diwazde	دوازدە	١٢
13	sêzde	سیزدە	١٣
14	çarde	چاردە	١٤
15	pazde	پازدە	١٥
16	şazde	شازدە	١٦
17	fievde	ھەفەدە	١٧
18	hejde	ھەزىزدە	١٨
19	nozde	نۆزدە	١٩
20	bîst	بیست	٢٠
21	bîs u yek	بیست و پەمەك	٢١
22	bîst u dû	بیست و دوو	٢٢
30	sî	سى	٣٠
31	sî u yek	سى و پەمەك	٣١
40	çil	چل	٤٠
50	penca	پەنچا	٥٠
60	şest	شەست	٦٠
70	fiefta	ھەفتا	٧٠
80	heştä	ھەشتا	٨٠
90	newed	نەود	٩٠

100	sed	سەد	100
101	sed u yek	سەد و يەك	101
200	dûsed	دوو سەد	200
1000	hezar	ھەزار	1000
1101	hezar u sed u yek	ھەزار و سەد و يەك	1101

### Tabloya 8.: Jimarên Rêzîn

Îngilîzi	Kurdî	Îngilîzî Kurdishî	
1st	yekem	7th	fiewtem
2nd	dûhem	8th	heştem
3rd	sêhem	9th	nohem
4th	çîwarem	10th	dehem
5th	pêncem	11th	yazdehem
6th	şesem	12th	duwazehem

### Morfolojîya Lêkerî

Sê cure lêkerên Kurdî hene: lêkerên xwerû (wekî *kirdin* [kirin]), lêkerên pêkhatî ku bi pêşgirekê ve dihêne çêkirin (wekî *der kirdin* [derxistin]) û lêkerên komplex. Lêkerên komplex ji lêkereke rader û ji navdêr an jî rengdêrekê pêk dihêن (wekî *kar kirdin* (kar kirin), *çak kirdin* (çê kirin)). Di Kurdî de dem, têperî û têneperî, deng, rawe, xwîyang û hejmar li ser lêkeran dihên xwîyanê. Niha em ê li ser çar heb ji van lêkeran bisekinin.

#### Dem

Berekse Farisî û Îngilîzi di Kurdiya Navendî de dema bê ya rêzimanî tuneye (forma dema bê ya lêkeran tune). Dîsa wekî "will" û "shall" a Îngilîzi, tu lêkerên alîkar tunene ku dema bê nîşan bidin. Di şûna wê de forma dema niha bi hokerekê ve dihê bikaranîn (wekî *derom* "Ez diçim" lê *sibeynê derom* "sibê diçim"). Bêyî nîşandereke demî, wekî "paşê", "sibê" an jî "pey du saetan" an jî bêyî ku ji konteksê bihê fêmkirin, kesek nikare ji wateya *derom* fêm bike ka gelo ew dihê wateya "ez ê biçim" an jî "ez diçim". Di dema niha de hemû lêker wekî hev dihêne kişandin (yanê, *de+koka lêkerê+paşnûsek*). Nûsekek bi awayeke zelal ne bêjeyek e ne jî gireyek e, wekî "I'll" a Îngilîzi ya di "I'll go home" (Ez ê biçim malê) an jî "t" ya Îngilîzi ya di "I can't do that" (Ez nikarim wê bikim). Nûsekên pey kokan dihên mîna "ll" wekî naşnûsek dihêne navkirin. Paşnûsekên di Soranî de yên ku di dema borî de dihêne bikaranîn di Tabloya 9an de hatîne dayîn.

Tabloya 10an kişandina lêkera *şoyıştin* (çûn) ya têneper nîşan dide. Koka lêkerê *yo* ye û bi dengdêrekê ve diqede (Not: "o" diguhere "w" yê wexta dengdêrek pey wê dihê).

**Tabloya 9.: Paşnûsek ji bo Kişandina Dema Niha**

Kokên bi dengdêran diqedin		Kokên bi bêdengan diqedin	
Yekjimar	Pirjimar	Yekjimar	Pirjimar
-m	-yn	-im	-în
-y(t)	-n	-î(t)	-in
-a(t)	-n	-ê(t)	-in

**Tabloya 10.: Kişandina Lékera Royıştinê (Çûn)**

	Yekjimar		Pirjimar	
Şexsê Yekem	<i>deřom</i>	diçim	<i>deřoyn</i>	Em diçin
Şexsê Duyem	<i>deřoy(t)</i>	diçî	<i>deřon</i>	Hun diçin
Şexsê Sêyem	<i>deřwa(t)</i>	diçe	<i>deřon</i>	Ew diçin

Neyînîya lêkerê bi guherîna pêşgira *de* yê bo pêşgira *nayê* çê dibe: *nařom* (naçim), *nařoy(t)* (naçî), *nařwa(t)* (naçe), *nařoyn* (Em naçin), *nařon* (Hun naçin), *nařon* (Ew naçin).

Tabloya 11an kişandina lékera *bîstinê* (bihîstin) nîşan dide ku koka wê bi bêdengekê diqede. Neyînîya *bîstinê* (bihîstin) wekî ya ḥroyıştinê ye: *nabîsim*, *nabîsi(t)*, *hwıd*. Tabloya 12an du lêkerên din dide jî bo nîşandana kişandina lêkeran ya dema niha: lékera *kirdin* (kirin) ku koka wê *ke* ye û lêkeran *bînîn* (dîtin) ku koka wê *bîn* e.

**Tabloya 11.: Kişandina Lékera *Bîstinê* (bihîstin) ku koka wê bi bêdengekê diqede**

	Yekjimar		Pirjimar	
Şexsê Yekem	<i>debîsim</i>	dibihîsim	<i>debîsîn</i>	Em dibihîsin
Şexsê Duyem	<i>debîsî(t)</i>	dibihîsî	<i>debîsin</i>	Hun dibihîsin
Şexsê Sêyem	<i>debîsê(t)</i>	dibihîse	<i>debîsin</i>	Ew dibihîsin

**Tabloya 12.: Kişandina Lékeran di Dema Niha de**

	Yekjimar		Pirjimar	
Şexsê Yekem	<i>dekem</i>	dikim	<i>dekeyn</i>	Em dikin
Şexsê Duyem	<i>dekey(t)</i>	dikî	<i>deken</i>	Hun dikin
Şexsê Sêyem	<i>deka(t)</i>	dike	<i>deken</i>	Ew dikin
Şexsê Yekem	<i>debînim</i>	dibînim	<i>debînîn</i>	Em dibînin
Şexsê Duyem	<i>debînî(t)</i>	dibînî	<i>debînin</i>	Hun dibînin
Şexsê Sêyem	<i>debînê(t)</i>	dibîne	<i>debînin</i>	Ew dibînin

## Demêñ Borî

Di Kurdîya Navendî de nêzîkî deh rê hene ji bo kişandina lêkeran di dema borî de. Li vir em ê tenê kişandina çar heb demêñ borî yên herî berbelav bidin: dema borîya têdeyî, dema borîya berdest, dema borîya nadîyar û çîrokîya dema borîya têdeyî. Ev form li gor têperbûn an jî têneperbûna lêkerê cuda dihêñ kişandin. Tablo-ya 13 û 14an kêşana lêkera têper *bîstin* (bihîstin) û lêkera têneper *çûn* nîşan dide.

**Tabloya 13.: Kişandina Dema Borî: Lêkerên Têper**

	Dema Borîya Têdeyî	Dema Borîya Berdest	Dema Borîya Nedîyar	Çîrokîya Dema Borîya Têdeyî
Şexsê Yekem yê Yekjimar	<i>bîstim</i> (min bihîst)	<i>dembîst</i> (min dibihîst)	<i>bîstûme</i> (min bîhîstîye)	<i>bîstibût</i> (min bîhîstibû)
Şexsê Duyem yê Yekjimar	<i>bîstit</i> (te bihîst)	<i>detbîst</i> (te dibihîst)	<i>bîstûte</i> (te bîhîstîye)	<i>bîstibût</i> (te bîhîstibû)
Şexsê Sêyem yê Yekjimar	<i>bîstî</i> (wê/wê bihîst)	<i>deybîst</i> (wî/wê dibihîst)	<i>bîstûye</i> (wî/wê bîhîstîye)	<i>bîstibûy</i> (wî/wê bîhîstibû)
Şexsê Yekem yê Pirjimar	<i>bîstiman</i> (me bihîst)	<i>demanbîst</i> (me dibihîst)	<i>bîstûmane</i> (me bîhîstîye)	<i>bîstibûman</i> (me bîhîstibû)
Şexsê Duyem yê Pirjimar	<i>bîstitan</i> (we bihîst)	<i>detanbîst</i> (we dibihîst)	<i>bîstûtane</i> (we bîhîstîye)	<i>bîstbûtan</i> (we bîhîstibû)
Şexsê Sêyem yê Pirjimar	<i>bîstyan</i> (wan bihîst)	<i>deyanbîst</i> (wan dibihîst)	<i>bîstûyane</i> (wan bîhîstîye)	<i>bîstbûyan</i> (wan bîhîstibû)

**Tabloya 14.: Kişandina Dema Borî: Lêkerên Têneper**

	Dema Borîya Têdeyî	Dema Borîya Berdest	Dema Borîya Nedîyar	Çîrokîya Dema Borîya Têdeyî
Şexsê Yekem yê Yekjimar	<i>çûm</i> (çûm)	<i>deçûm</i> (diçûm)	<i>çûm</i> (çûme)	<i>çûbûm</i> (çûbûm)
Şexsê Duyem yê Yekjimar	<i>çûy(t)</i> (çûyî)	<i>deçûy(t)</i> (diçûyî)	<i>çûy(t)</i> (çûyî)	<i>çûbûy(t)</i> (çûbûyî)
Şexsê Sêyem yê Yekjimar	<i>çû</i> (çû)	<i>deçû</i> (diçû)	<i>çûwe</i> (çûye)	<i>çûbû</i> (çûbû)
Şexsê Yekem yê Pirjimar	<i>çûyn</i> (em çûn)	<i>deçûyn</i> (em dicûn)	<i>çûyn</i> (em çûne)	<i>çûbûyn</i> (em çûbûn)
Şexsê Duyem yê Pirjimar	<i>çûn</i> (hun çûn)	<i>deçûn</i> (hun dicûn)	<i>çûn</i> (hun çûne)	<i>çûbûn</i> (hun çûbûn)
Şexsê Sêyem yê Pirjimar	<i>çûn</i> (ew çûn)	<i>deçûn</i> (ew dicûn)	<i>çûn</i> (ew dicûne)	<i>çûbûn</i> (ew çûbûn)

## Dengê Tebatî

Di gelek rewşan de dengê tebatî bi lêzêdekirina paşgira -rê û -ra li koka dema niha ve çê dibe. Dengê tebatî yê dema niha bi vî awayî çê dibe: *de+koka dema niha+-rê: wekî dexurê* (dihê xwarin) an jî *denûsrê* (dihê nivîsîn). Dengê tebatî yê dema borîya têdeyî bi koka dema niha û bi paşgira -ra ve çê dibe: wekî *xura* (hat xwarin) an jî *nûsra* (hat nivîsîn). Dengê tebatî yê dema borîya nedîyar bi koka dema borî ya têper û bi paşgirên -ra+w/we ve çê dibe: wekî *xurawe* (hatîye xwarin) an jî *nusrawe* (hatîye nivîsîn). Wekî dawî, dengê tebatî yê çîrokîya dema borîya têdeyî bi koka dema borî ya lêkerê û bi paşgirên -ra+bû ve dihê çêkirin: wekî *xurabû* (hatibû xwarin) an jî *nusrabû* (hatibû nivîsîn). Bi vê mijarê ve eleqedar, divê behsa du tiştan jîbihê kirin. Ya ewil, hemû dengê tebatî yên li vê derê hatine behskirin bi şexsê sêyem yê yekjimar hatine kişandin. Ya duyem, wekî hemû rêzimana (wekî lêkerên nerêzikî yên Îngilizî), di rêzimana Kurdî de jî hin nerêzikî hene di avakirina dengê tebatî de.

Raweya fermanî bi pêşgira *bi* û koka lêkerê ve dihê çêkirin. Wek mînak, lêkera *þoyîstin* (çûyîn) ku koka wê ïo ye, di raweya fermanî de dibe *bîro*. Neyînîya raweya fermanî bi pêşgira *me* û koka lêkerê ve dihê çêkirin: *meþo* (neçe), *meçû* (meçe). Di lêkerên complex (du perse) de pêşgira raweya fermanî dikeve navbera her du bêjeyan: wekî *karkirdin* (kar kirin) dibe *karbike* (kar bike).

Lêkerên pêkhatî bi lêkerekê (wekî *xistin*) û pêşgirekê (wekî *da*) dihêñ çêkirin, wekî *daxistin* (girtin). Wek mînak, *Dûkandareke dûkanekey daxist* (Dikandêr dikan girt). Dîsa heman lêker dibe ku bi pêşgireke din ve (wekî *leser kirdin* (li xwe kirin) an rengderekê ve (wekî *çak* [baş] kirdin (kirin); *çak* kirdin (baş kirin)) û an jî bi navderekê ve (wekî *hawar kirdin* (hawar kirin) bibe yek û bibe lêkereke din).

## Sentaks

Ne wekî rêza bêjeyan kirde-lêker-bireser ya Îngilizî, Kurdî xwedîyê vê rêza bêjeyan e: kirde-bireser-lêker. Ev rêz bi tabetî jî bo lêkerên têper rast e ku ev lêker xwedîyê bireserekê ne: wekî "xwarin", "ajotin", "tevdan". Bereksê van lêkeran lêkerên têneper xwedîyê bireserekê nînin: wekî "razan", "kenîn" û "çûn". Kesek dikare "biçe" lê nikare tiştek yan jî kesek "biçe" bike (wekî *min sêwêk dexom* (ez sêvekê dixwim) an jî *ew dengêkî bîst* (wî dengekbihist). Ne her wext lê bi piranî, hokerên demî û yên rewşî berîya lêkerî dihêñ, lê hokerên cihî pey lêkerê dihêñ: *emþo deçim bo bazar* (îro dicim bazarê), *Shaho le nekaw pêkenî* (Şaho nişkava kenî), *Shaho be pele çû bo férge* (Şaho bi ecele çû dibistanê). Wextê hemû perçeyen hevokê di nav hevokê de hebin, avanîya hevokê ya herî berbelav ev e: Hokerên demî - kirde - hokerên rewşî - lêker - hokerên cihî: *emþo*, *Shaho be pele çû bo bazar* (îro şaho bi ecele çû bazarê). Di dema niha da nîşankera kirdeyê li ser lêkerê dihê nîşandan: *min Shaho debînim* (Ez Şaho dibînim). Lê di demêñ borî, hevokêñ têper

de nîşankera kirdeyê li ser bêjeya berîya lêkerê zêde dibe: *Pêrê, Shahom dît* (Pêr min Şaho dît). Eger pirsa vê hevokê bihê pirsîn, wê bersiv ev be; *pêrêm dît* (min pêr dît) an jî dikare wiha be: *Pêrê dîtim* (min pêr dît).

Hevokên Kurdî dikarin bi du awayan di nav têkilîyê de bin: hevokên hevseng û yên binseng. Hevokên hevseng bi hatina ber hev ve û bi gihanekên hevseng ve dihêن girêdan. Mînakek ji bo ya ewil: *Şofîreke debezî, silawî kird, duway çak u xoşî danışt, daway awî kird, gutî: Tînû me, gelêk.* (Ajovan daket, silav da, xal xatir pirsî, av xwest, got: tî me, gelek).

### **Hevokên Hevseng**

Her çiqas di zimanê rojane de kêm be jî, gihanek jî ji bo girêdana hevokên hevseng dihêne bikaranîn. Gîhaneka herî berbelav paşnûseka =uyê ye. Gihanekên din: *yan-yan, belam* (lê), *eger an jî bêtû: min çûm u danıştim* (Ez çûm û min got), *yan min deçim yan ew deçêt* (yan ez diçim yan jî ew), *min çûm, belam ew nehat* (ez çûm, lê ew nehat), *bêtû neye, minîş naçim* (Eger tu neyê, ez jî naçim). (Not: paşnûseka îş dihê wateya "jî", nexwe minîş dihê wateya "min jî / ez jî")

### **Hevokên Binseng**

Hevokên temamker, yên peywendîyê û yên hokerî bi gîhaneka *ke* (ku) ve dihêne çêkirin. Gîhanekên hevedudanî yên ku *keyê* bi kar dihînin jî ev in: *her ke, be mercêk ke* (bi mercê ku). Gihanekên hevokên binseng yên din ev in: *ta/heta, taekû/hetawekû* (da ku/heta ku), *bêtû/eger* (eger).

### **Vokubularî / Bêje**

Her du zaravayêñ Kurdî, KN û KBK bi gelek devokên xwe ve bêjeyêñ xwe zêde kirine. Lê dîsa jî, di Kurdîya dihê axaftin de hêj jî gelek bêjeyêñ qerzkirî hene ku ji zimanêñ Erebî, Farisî û Tirkî hatine standin. Kurdîya standart, bi zanebûn û bi awayekî berbiçav, bi taybetî li Iraqê, zimanê xwe ji bêjeyêñ qerzkirî, bi taybetî ji Erebî paqîj kirîye. Di salêñ dawî de di şûna Erebî de, ji zimanêñ Ewrupayî bi taybetî ji Îngilizî ji bo medya û pirtûkên dibistanê bêje dihêne qerzkirin. Bêjeyêñ wekî *tolerans* "tolerance", *sponser* "sponsor", *sîvîl* "civil", *festîval* "festîval" û *kampeyn* "campaign" niha gelek berbelav in. Dîsa meriv dikare rasfî gelek gotinan bihê ku bi temamî wekî Îngilizî ne: wekî navê programên televîzyonê (wekî *Top Story; Style*), navê apartmanan (wekî *Naz City*) û hwd.

Li vir em ê hin bêje û gotinêñ Kurdî bidin yên ku di KN û KBKyê de hevpar in. Ji bo tevlihevî çê nebe, di bêjeyêñ ne wekî hev de, em ê ji bo Kurdîya Navendî (N) û ji bo Kurdîya Bakurê jî (BK) binivîsin:

*erê, na, fermû (N) / fermo (BK), spas, ser, dest, çaw (N) / çav (BK), mû, kezî, lût/kepo (N) / poz<sup>3</sup> (BK), lêw (N) / lêv (BK), kon (N) / kevn (BK), nan, aw (N) / av (BK), kiç (N) /*

3 Kepî di kurmancî de jî heye (Nota wergêr)

keç (BK), kuṛ (N) / kuṛ an jî xort (BK), jin, pîyaw (N) / mîr (BK), bira, xuşk (N) / xuşk an jî xwîşk (BK), bab/bawik (N) / bab an jî bav (BK), dayik, gut (N) / gul (BK), asman (N) / asîman (BK), herd (N) / erd (BK), roj, şew (N) / şev (BK), xanû (N) / xanî (BK), mal (N) / mal (BK), dar, şekir, şîrîn/şîrîn, birsî (N) / birsî an jî birçî (BK), tînû (N) / tî (BK), pîş (N) / pîş an jî qirêjî (BK), pak, xew, mandê (N) / mandî (BK), kem (N) / kêm (BK), gelêk (N) / gelek (BK); xebat, azadî, silaw (N) / silav (BK), be xêr hatî (N) / bi xêr hatî (BK), to çonî? (N) / tu çawanî i an jî tu çawa yî? (BK), min baş im (N) / ez baş im (BK), spas, to çi dekey? (N) / tu çi dikî? (BK), maława (N) / malava (BK) xuwa hafiz (N) / bi xatîre te an jî bi xatira te (BK), min Kurd im (N) / ez Kurd im (BK), min xuwendkar im (N) / ez xwendekar im (BK), min mamostam (N) / ez mamosta me (BK), beyanît baş (N) / sipêde baş (BK), roj baş, şew baş (N) / şev baş (BK), baş e, baş nîye (N) / baş nîne yan jî ne baş e (BK).

### Metna Mînak

Tabloya 15an ji çirokekê hatîye wergirtin ku ji hêla axêvereke Kurdî ya ji Suleymanîyea Kurdistana Iraqê ve hatîye gotin. Metn bi KNyê ye, lê hem bi alfabebla Kurdo-Erebî hem jî bi ya Kurdo Latînî hatiye nivîsîn (Ji Wahby û Edmonds 1966, 176-179 hatîye standin.)

### Tabloya 15.: Metna Mînak, bi Du Alfabeyan, bi Wergera Kurmancî ve

Bextyar u Bedbext dû bira bûn le dêyek da	بەختیار و بەدبەخت دوو برا بۇون لە دىنیمەك دا
Bextyar û Bedbext du bira bûn li gundekî.	
Rojêk rojan bîfaryan da ke biroñ bo şaran, pare peyda biken; we her bo sibeynê serî xoyan helgirt u pêkewe kewtne ū...	رۆژئیک رۆژان بیرباربان دا کە بېرقن بۇ شاران، پاره پەيدا بکەن؛ وە هەر بۇ سېھىنى سەری خۇيان ھەلگرت و پېڭوھ كەوتتە رى... .
Rojek birtyar dan bo biçine bajaran, pere qezenc bikin; û roja din serê sibê serê xwe hildan û ketine ū...	
Bo nîwerô geyistîne ser kanî u awêk.	بۇ نیوەرۇ گەشىتتە سەر کانى و ئازىز.
Nîvroyê gîhîstîne ser kanîyek û avekê.	
Wityan, “Ba lêre wiçanêkî bo bideyn u nanî nîweřoy lê bixoyn”, we danîştin le giwêy kanîyek.	وٽيان [ا گونیان]، ” با لىنرە و چانتىكى بۇ بدەپن و نانى نیوەرۇ لى بخۇين“؛ وە دانىشتىن لە گۈنىي كانىيەك.
Gotin, “Em li vê derê bêhna xwe vedin û nanê nîvroyê bixwin”; û rûniştin ber kanîyekê.	
Înca Bedbext rûy kirde Bextyar: “Bextyar, ba bo nîwerô têşûyekey to bixoyn, têşûyekey minîş bo êwarêman ....	ئىنچا بەدبەخت روویى كر دە بەختیار؛ بەختیار، با بۇ نیوەرۇ تېشۇويە كەى تو بخۇين، تېشۇويەكەى منىش بۇ ئیوارىمان ...
Paşê Bedbext li Bextyarî zivirî; “Bo xwarina nîvroyê em para te bixwin, para min jî bo êvarê ...	
Bextyar desesiřkey piştî xoy kirdewe, we le ser erzekey raxist.	بەختیار دەسەرسەر مەكەپ پىشى خۆى كردىمۇ، وە لە سەر ئەرز مەكەپ را خاست.
Bextyar egala pişa xwe vekir û li ser erdê raxist.	

Sa her çîyekî tiya bû xwardyan, we hendê boy hesanewe u kewtnewe rê.	سا هەر چیبەی تیا بوو خواردیان، وە ھەندى بۆی حمسانەوە و کەمۆتەنەوە ری.
Her tiştên tê de bû xwarin û bêhna xwe vedan û ketine rê.	
Êware be ser hat.	ئیپاره بسمر هات.
Êvar bi ser wan de hat.	
Hêşa awayî dûr bû, geyîstne dûrêyanêk, kanî u awakî lê bû.	ھیشتا ناوایی دور بوو، گەیشتنە دور بیانێک، کانی و ناوونکی لی بوو.
Gund hêj dûr bû, gihîştine durêyekê ku kanî û avek lê bû.	
Em care Bextyar rûy kirde Bedbext u witî (/ gutî): "Bedbext, min zorim birsîye; wa diyare awayîs zor dûr e; ba lêre danîşîn, şew bikeyn, înca ekewînewe (/dekewînewe) rê.	ئەم جاره بختیار رووی کرده بەدېخەت و توی [اگوتی]؛ بەدېخەت، من زۆرم برسییە؛ و دیاره ناوایش زور دورە؛ با لىزە دانیشین، شەو بکمین، نینجا نەمکەنەوە [دەمکەنەوە] ری.
Vê carê Bextyar vegerîya Bedbext û gotîyê: "Ez pir birçî me; wa diyar e gund gelek dûr e; li vir em rûnin, şeva xwe derbas bikin, paşê bîkevine rê.	
Bextyar witî (/gotî): "Hew, be Xwa, min le têşûwekem besî to nadem, her besî xom eka (/ deka).	بەختیار وتوی [اگوتی]؛ 'ھەو، بە خوا، من لە تیشۆوەکم بەشی تو نادەم، هەر بەشی خۆم نەمکا [دەمکا].
Bextyar gotê: "Hew, bi Xwedê, ez ji xwarina xwe para te nadim, ew hemû têra min bike.	
Bextyar, ke em napiyawîyey dî, kas bû, we her ewendey pê kira biłê: "ke wa bû, Bedbext, itir mn hawrêy bedsiriştêkî wekû to nakem; lem dû rûye yekê helbijêre, minîş ewî tiryan egrim (/degrim)".	بەختیار، کە ئەم ناپیاوییە دی، کاس بوو، وە ھەنەندەی، پی کرا بلىي، 'کە وا بوو، بەدېخەت، بیتر من ھاور تیپی بەدرشتنیکی و مکوو تو ناکەم؛ لەم دوو ریتە يەمکیک ھەلپیزیرە، منیش ئەمۇی تریان ئەمگرم [ادمگرم].
Bextyar, ku ev bêbextîya wî dît, matmayî ma û tenê karî jê re wiha bêje: «ku wiha be, Bedbext, êdî ez hevrêtîyê bi bêbextekî wekî te re nakim; ji van her du rîyan yekê hilbijêre, Ez ê jî ya din bigirim».	
Bedbext rîgayekyanî bo xoy helbijard, Bextyarîş milî rîgekey tirî girt u lêk ciwê bûnewe.	بەدېخەت ریگاپەکیانی بۆ خۆی ھەلپیزارد، بەختیاریش ملى ریگەمکەمی تری گرت و لیزک جوی بۇونمۇه.
Bedbext rîyek ji bo xwe hilbijart, Bextyar jî rîya dinê girt û ji hev cuda bûn.	
Bextyar ke tarîkî be ser da hat tûşî aşekonêk bû ...	بەختیار کە تاریکی بسمردا دا هات تووشی ناشەمکۆنیک بۇو ...
Bextyar ku tarî bi ser de hat rastî aşekenvnekê hat.	
Ewendey pê neçû şêrek hate jûrewe... le paş ew gurg kirdî be jûra ... we rîewî geyişt.	ئەنەندەی پی نەچوو شىرىتەك هاتە ژۇورەوە ... لە پاش ئەم گورگ کردى بەزۇورا ... وە ریتۆی گەیشت.
Pir wext ser de neçû, şêrek hate hundir ... pey wî gur kete hundir ... û rovî gihişte hundir.	
... Şîr rûy kirde rîwî: "... demêke hiç deng u basêkt bo negêrawmetewe".	... شىر رووی کرده ریتۆی؛ ... دەمەنکە هىچ دەنگ و باسېنکت بۆ ئەمگىز اوەمەنەوە.
Şîr berê xwe da rovîyi: "... demek e tu qet xeberekê ji bo min nayîni".	

Rêwî witî (/gutî): “qurban, ... mişkêk heye lem aşe kone da, diwanze dînarî zêrî heye; hemû sibeynê, ke xor ekewêtewe (/ dekewêtewe) aşekewe, em mişke em zêrane dêneôte derewe, le ber xoreke ūyan exa (/dexa) w yaryan pê eka (/deka)...	رئوی و تی [اگرتی]؛ قوربان، ... مشکیک ههیه لەم ناشەکونندا، دوانزه دیناری زېری ههیه؛ هەممۇ سىبەننى كە خۆز نەكمۇننە [ادەكمۇننە] ناشەکەوە، ئەم مشکە ئەم زېرانە دېتىنە دەرەوە، لەپەر خۆرمەكە رايان نەخا [ادەخا] و ياريان پى نەما [ادەما] ...
Rovî got, “Qurban, ... mişkek di vê aşê kavil de heye, diwazdeh zêrên wî hene; her sibeh, ku tîrêj dikevine aşê, ev mişk van zêran datîne derva, li ber tavê datîne û bi wan re dilîze ...	شای جانەوران، كە ئەممە بىست، سپاسى مام رئوی كىرد؛ وە لەپاش نەختى ھاوپىرسەكتى تىز ئەنچۈمىن پلەۋەيانلى كىرد.
Şahê heywanan, ku ev bihîst, spasî bi rovî kir; û pey hin axaftinê dîtir civat belav bû.	بەختىيار، كە گۇنىي لەم قىسانە بىبو، ئىتەر خەنچەجۇوه چاۋى؛ چاۋەرۋانى خۆرھەلات بۇو ...
Bextyar, ke giwêy lem qisane bibû, îtir xew neçuwe çawî; çawerŵanî xorhelat bû ...	Bextyar, ke giwêy lem qisane bibû, îtir xew neçuwe çawî; çawerŵanî xorhelat bû ...
Le piň le kunêkewe şitêk brîskayewe. Serî mişkêk, şitêkî brîskedar be demewe, le kunêkewe hate derê ...	لە پىر لە كۆنیكەوە شىتىك بىرىسکاپىوه. سەری مشکیاف، شىتىكى بىرىسکەدار بە دەممۇوه، لە كۆنیكەوە ھاتە دەرى ...
Paşê di qulekê de tiştek biriqî. Serê mişkekî, tiştekî biriqî di devan de ji qulê derket ...	بەختىيار چوو، زېرەكەنەن كۆ كەرده و خەستىبىي گېرفاڭىيەوە، وە لە ناشەكە ھاتە دەرە ...
Bextyar çû, zêr kom kirin û xistine bêrika xwe û ji aşî derket ...	Bextyar çû, zêr kom kirin û xistine bêrika xwe û ji aşî derket ...
Îtir zor dewlemend bibû ...	ئىتەر زۆر دەولەمند بىبوو ...
Êdî pir dewlemend bûbû ...	Êdî pir dewlemend bûbû ...
Rojék le rojan rëbiwarê hate jürewe u piyaleyê awî kird be sera, we ke lêbuwewe henaseyêkî helkêsa.	رۇزىك لە رۇزان رېبىوارى ھاتە زۇورموھ و پىللەپىي ناؤى كىرد بە سەرا، وە كە لېپۇرموھ ھەنزاھىنەكى ھەلگىشىا.
Rojek ji rojan rêuwyek hate hundir û pîyaleyek av daqurtand û heta jê hat nefesek stand.	Rojek ji rojan rêuwyek hate hundir û pîyaleyek av daqurtand û heta jê hat nefesek stand.
Dergawan desbecê çû be layewe we pê wit (/gut) ke xawenmal tika eke (/deka) ke bicête lay.	دەرگاوان دەسبەچىن چوو بە لايپوھ و پىنى و ت [اگرت] كە خاۋەنمەل تىكا نەما [ادەما] كە بېتىھ لاي.
Dergevan cîda çû ber wî û gotê ku xwedîmal dixwaze biçe hinda wî.	Dergevan cîda çû ber wî û gotê ku xwedîmal dixwaze biçe hinda wî.
Řebwaryan birde lay Bextyar.	رېبىواريان بىردى لاي بەختىيار.
Rêwî birin ba Bextyar.	Rêwî birin ba Bextyar.
Len paş nextê xoşî u çomî Bextyar witî (/gutî): “bira giyan, ... ewey min heme le gel to da beşyan ekem ...	لەپاش نەختى خۆشى و چۈنى بەختىار و تى [اگرتى]؛ بىرا گىان، ... ئۇوهى من ھەممە لە گەمل تۇدا بېشىان نەكەم ...
Pey halpirsinê Bextyar gotîyê: bira can, ... tiştê ez xwedîyê wan im ez ê bi te re parve bikim...	Pey halpirsinê Bextyar gotîyê: bira can, ... tiştê ez xwedîyê wan im ez ê bi te re parve bikim...

Bedbext ... witî (/gutî): ebê pêm blêy, Bextyar, to em dewle le kiwê u çon cing kewtuwe; minîş ecim, wekû to peyday ekem.	بڵدەخت ... گئی؛ نەبىي بىم بائى، بەختىار، تو نەم دەولەتە لە كوى و چۈن چىنگ كەمتووە، مىنىش نەچم، وەكۇ تو پەيداى نەكمەن.
Bedbext ...gotê: «Divê tu ji min re bibêji, Bextyar, te ev zengînî li ku û çawa peyda kir; ez ê jî biçim û peyda bikim.	ھەرچەند بەختىار بىسەريا ھات ... سوودىكى نېبوو ... بەختىار كە لە قىشكانى بۇوه، ئىتىر بەلەخت ئازامى نەگرت، دەرىپەرىيە دەرەوه بەرەو ئاش.
Herçend Bextyar be serya hat... südêkî nebû... Bextyar ke le qisekanî bûwewe, îtir Bedbext aramî negirt, derperye derewe berew aş.	ھەرچەند بەختىار بىسەريا ھات ... سوودىكى نېبوو ... بەختىار كە لە قىشكانى بۇوه، ئىتىر بەلەخت ئازامى نەگرت، دەرىپەرىيە دەرەوه بەرەو ئاش.
Herçend Bextyar xwest wî iqna bike ... lê bi ser ne ket ... Bextyar dema qiseta xwe jê re got, êdî aramî bi Bedbextî neket, bi lez û bez ber bi aşî ve çû.	چورە زۇورەوە، وەمکۇ بەختىار كەردىوو لە پېشت دۆلەنەكەمە خۆى مات دا.
Çuwe jûrewe, we wekû Bextyar kirdbûy le pişt dolyanekewe xoy mat da.	شەھۇ تەھاوا تارىيە بىبۇ كە شىزىك لە پېزىكا كەردى بە زۇورا و لە ناوەندى ئاشەكەدا ھەللىقەتىكا لەپاش نەمۇ ...
Çû hundir, wekî ku Bextyar kiribû li pişt dolyanê xwe veşart.	شەھۇ تەھاوا تارىيە بىبۇ كە شىزىك لە پېزىكا كەردى بە زۇورا و لە ناوەندى ئاشەكەدا ھەللىقەتىكا لەپاش نەمۇ ...
Şew tewaw tarîk bibû ke şêrêk le piřeka kirdî be jûra u le nawendî aseke da heltüteka. Le paş ew ...	شەھۇ تەھاوا تارىيە بىبۇ كە شىزىك لە پېزىكا كەردى بە زۇورا و لە ناوەندى ئاشەكەدا ھەللىقەتىكا لەپاش نەمۇ ...
Şev bi temamî tarî bûbû ku şêrek nişkave ket hundir û berê xwe da nîveka aşî. Pişti wî ...	ئىنچا شىزىك رەۋوی كەردى مام رىتىيى: '... نەمە بۇ دەمىنەكە درەنگ و باسىكت بۇ من نەڭىز اوە تەھو؟'
Înca şêr rûy kirde mam rîwî: " ... ewe bo demêk e deng u basêkit bo min negêrawetewe?"	ئىنچا شىزىك رەۋوی كەردى مام رىتىيى: '... نەمە بۇ دەمىنەكە درەنگ و باسىكت بۇ من نەڭىز اوە تەھو؟'
Vêca şêr zivirî mam rovî: " ... ev wextek e ez xeberekê ji te nabihîzim?	رەۋىي گئى؟ 'قوربان ... جارى پېشىوو كاتى كە لىزە دا نەو ئاگايىلەم بۇ نەڭىز ايتەمە، ئادىزى ادى لەدۆلەنەكەمە خۆى مات دابۇو، گۇنى لە ھەممۇ بىبۇ ...
Řêwî witî: "qurban ... carî pêşû katê ke lêre da ew agayanem bo egêraytewe, ademîzadê lew dolyanekewe xoy mat dabû, giwêy le hemû bibû ...	رەۋىي گئى؟ 'قوربان ... جارى پېشىوو كاتى كە لىزە دا نەو ئاگايىلەم بۇ نەڭىز ايتەمە، ئادىزى ادى لەدۆلەنەكەمە خۆى مات دابۇو، گۇنى لە ھەممۇ بىبۇ ...
Rovî gotê: "Qurban ... cara pêşî ku min li vir ew agahî ji bo te hanî, zelamekî di pişt dolyanê de xwe veşartibû û her tişt bihîstibû..."	شىر، كە نەمەي بىست، گئى: 'ئادى، نامەرتان نەكمەن، ناشەكە بىگەرتنى ئەمە خوايى، شىرى ئەمە خوايى دەرىپەرىيە دەرىپەرىيە ...
Şêr, ke emey bîst, witî: "adey, namerdtan neken, aseke bigerîn; eme Xwa ye, şêwî em êwareyeman bo derçê" ...	شىر، كە نەمەي بىست، گئى: 'ئادى، نامەرتان نەكمەن، ناشەكە بىگەرتنى ئەمە خوايى، شىرى ئەمە خوايى دەرىپەرىيە دەرىپەرىيە ...
Şêr, ku ev bihîst, gotê; "De, xwe namerd nekin, li aşî bigerin; Xwedê heye, dibe ku şîva me ya vê êvarê derkeve" ...	شىر، كە نەمەي بىست، گئى: 'ئادى، نامەرتان نەكمەن، ناشەكە بىگەرتنى ئەمە خوايى، شىرى ئەمە خوايى دەرىپەرىيە دەرىپەرىيە ...
Her ke çûne ewye dolyanekewe, Bedbextyan doziyewe ...	ھەر كە چۈرنە نەھىيە دۆلەنەكەمە، بەلەختىان دۆزىيەوە ...
Çawa ku çûne wî alîyê dolyanê, bedbext dîtin.	منىش ھاتىمەوە و ھېچىان نەدامى.
Minîş hatmewe u hîçiyân nedamê.	
Ez jî hatim lê tiştek nedane min.	

(Not: Hevoka dawî di Kurdî de gotinek e ku çîrokbej bi wê nîşan dide ku ev dawîya çîrokê ye. Ev gotin dibe ku li gor herêman hinek biguhere.)

## Agahî

Ez spasdarê Erik Anonby, Michael Chyet û Deniz Ekici me ji bo fikrên wan yên halê musvedde yê vê xebatê. Ez tenê berpirsê vê naverokê me.

## Jî bo Zêdetir Xwendinê

- Chyet, M.L. (2003). *Kurdish-English Dictionary: Ferhenga kurmancî-Inglîzî*. New Haven, CT: Yale University Press.
- Ekici, D. (2010). *Beginning Kurmanji Kurdish (DVD-ROM)*. Tucson: University of Arizona.
- Haig, G., and Öpengin, E. (Eds.) (2014). "Introduction to Special Issue. Kurdish: A Critical Research Overview." *Kurdish Studies*, vol. 2, no. 2, 99-122.
- Haig, G., and Öpengin, E. (2015). "Kurmanji Kurdish in Turkey: Structure, Varieties, and Status." [https://www.academia.edu/17650650/Kurmanji\\_in\\_Turkey\\_structure\\_varieties\\_and\\_status](https://www.academia.edu/17650650/Kurmanji_in_Turkey_structure_varieties_and_status)
- Hassanpour, A. (1992). *Nationalism and language in Kurdistan, 1918-1985*. San Fransisco: Mellen Research University Press.
- Karadaghi, R. (2006). *The Azadi English-Kurdish (Central K) Dictionary*. Teheran: Elsan Publishing House.
- Sheyholislami, J. (2015). "Language Varieties of the Kurds." In W. Taucher, M. Vogl, and P. Webinger (Eds.), *The Kurds: History, Religion, Language, Politics* (pp. 30-51). Vienna, Austria: Austrian Federal Ministry of the Interior.
- Sheyholislami, J., Hassanpour, A., and Skutnabb-Kangas, T. (Eds.). (2012). *The Kurdish Linguistic Landscape: Vitality, Linguicide and Resistance*. Special issue of *International Journal of the Sociology of Language*, vol. 2012, no. 217.
- Thackston, W.M. (n.d.). *Kurmanji Kurdish - A Reference Grammar with Selected Readings*. [http://www.fas.harvard.edu/-iranian/Kurmanji/kurmanji\\_1\\_grammar.pdf](http://www.fas.harvard.edu/-iranian/Kurmanji/kurmanji_1_grammar.pdf)
- Thackston, W. M. (n.d.). *Sorani Kurdish - A Reference Grammar with Selected Reading*. Accessed April 10, 2016. [http://www.fas.harvard.edu/-iranian/Sorani/sorani\\_1\\_grammar.pdf](http://www.fas.harvard.edu/-iranian/Sorani/sorani_1_grammar.pdf)
- Wahby, T. and C.J. Edmonds. (1966). *A Kurdish-English Dictionary*. Oxford: Clarendon Press.